

Hîcab, bilêta erzan a
bihuştê

»»» R:9



Şerefkendî remza û
sembola hertimiye gelê
xweye

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (430) 22-09-2022 Buha (1000) Tûmen

Jîna bû bi remza xe-
bat û berxudanê

»»» R:4

Zêdebûna metirsiyê li ser
Rojavayê kurdistanê

»»» R:8

Girevgirtina medenî di xwînê de sor kirin



Spasnameya Navenda Birêveberiya Giştî ya Partiya Demokart li derheq tevlibûna herdu aliyên Demokratan

Navenda Birêveberiya Giştî ya Partiya Demokrat li derheq hevgirtina herdu aliyên Demokratan spasnameyek belav kir

Deqa spasnameyê wiha ye:

Komên xelkê Kurdistanê

Partî û hêzên siyasî yên dost û hevpeyman

Civatgeh û civata navneteweyî

Kesayetiyên azadîxwaz û şoreşger

Malbatên serbilind yên şehîdan

Girtiyên siyasî

Herçawan ku haydar in, roja 30`ê Xermanana îsal, beramber 21`ê Îlona 2022`an, piştî derbaskirina piroseya danûstandinên di vê derheqê de, piroseya hewl bo hevgirtina micid ya Demokratan gihîşt bi encamê, û di merasimekê de mizigîniya gihîştina bi encamê ya wan hewlan, bo raya xelkê Kurdistanê hat ragihandin.

Hewceyî gotinê ye ku, her li deşpêka piroseya danûstandinan heta dawîn pêngavên vê piroseyê, piştevanî, hewl û helwesta tev endam, alîgir, kadr, pêşmerge, dost, dilsozên partiyê û tevgera rewşa ya me, cihê dilgermî û handana heyetên danûstandinan û rêberiya herdu aliyên Demokratan di ber bi pêşvebirina piroseya hevgirtinê û çareseriyê aştengiyên heyî yên li ser rêya me, bi mebesta bideştveanîna daxwazkariyên rewşa yên wan û bicihanîn û tespîtkirin û îradeya micid ya rêberî û bendiya Demokratan li derheq hevgirtina dubare ya refên Partiyê bû.



Piştî hevgirtinê jî, şîpelek berfireh ji coş û hêvî û nîşandana dilxweşiyê bi awayên cuda, li seranserê Kurdistan û aliyên şoreşger yên siyasî yên azadîxwaz ên Kurdistan û Îranê ji xwe girt û xelk, hêzên siyasî, civetgeh û civatên navneteweyî yên dost û hevpeyman bi şandina peyamên pîrozbahiyê û serdana binke û nûneratiyên me li Kurdistan û cihên cuda, dixweşî û piştevaniyên xwe li derheq vê hevgirtinê de nîşan dan.

Her bi vê hilkeftê hewce dizanin ku li ser navê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, ji dilsozî, alîkarî û piştevaniyên berdewam yên we heta gihîştin bi encamê a piroseya danûstandinan, spasî û deşxweşiyê bibêjin û bi bilind nirxandina îhsasên pak û peyamên tijî hêvî yên pîrozbahiyên we û herwisa pêwendî û hevdîtinên we, radigihînin ku Partiya me li hember piştevanî û keremên we yên bê dawî, xwe berpirsyar dizane û di birêvebirina rola micidane ya şoreşgerî û encamdana berpirsayeriya neteweyî, siyasî û dîrokî ya xwe dê berdewam be û bi pejrandina pîrensîp û bingeheên demokratîk û mirovî yên xwe, pêngavên bandordar li derheq hevgirtina zêdetir a refên şoreşê li rêya gihîştin bi armancên tevgera rewşa û nirx û bihaya taybet bo tîkîlî û alîkariyên dostane û şoreşgerî digel tevahiya dost, dilsoz û şoreşgirên rêya azadiya neteweya Kurd û rizgarbûna nîştimana me qayîl e.

Rêz û spas

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Navenda Birêveberiya Giştî

Şerefkendî remza û sembola hertimiye gelê xweye



N: Nûredîn Sofîzade

Mirovên ku di dîroka neteweya xwe de xwedî bandor in û rol û keda wan li pêxema berjewendiya giştî ya neteweya wan de hatibe xuyakirin, bi taybet ger ev kes an mirovê xwedî bandor hemî jiyana xwe danabe bo xizmeta doza gelê xwe û her di vê rêkê de jî bona gihîştina bi armancên bilind yên gel de canê xwe gorî kiribe, tu caran ked û rola wî, rêbaza wî, jî aliyê gelê wî ve nayê jibîrkirin, mirovên han di dîroka neteweya xwe de dibin remz û simbol û rola rêberatiya wan hertim dimîne û zindiye.

Di dîroka neteweya Kurd de jî, renga zaf bin ev kes û kesayetî û rêberên ku piştî nemana bi cêsteye xwe, bo heta hetayî bûne rêbaz, bûne simbol û nav û yada wan cem gelê Kurd zindiye.

Tevgêra rizgarîxwaziya kurdan li Rojhilatê Kurdistanê de jî hene ev kesên ku bûne rêberên nemir û hemî azadîxwez û xebatkarekî doza Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, xwe rêvîngê hizr û xebat û rolê wan dizanin, navê wan jibîrneçoyî ye û bûne stêrkên rohnîkêre riya xebatê, wate rêke û rêbaza wan dirêjî heye, ku em dikarin Amajê bi wan rêberên mezin bikin ku li ser xebata bona bidest ve anîna qedera Kurdan û rizgariya Kurdistanê canê xwe gorî kirine, ji wan bo mînak: Emîrxanê Lepzêrîn, Simkoyê Şikak, Pêşewa Qazîmihemed, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî.



Di vê nivîsê de ez dixwazim basê rol û kesekî tucar nemir bikim ku ev jî Dr. Sadiq Şerefkandî Sekertêrê berê yê PDKÎ ye.

Herwekî hemî aliyek dizanin, di 17ê Îlona îsl, 30 sal bi ser terorkirina Şerefkendî û hevalên wî Fetah Ebdulî, Humayun Erdelan û Nûrî Dêhkurdî re derbas dibe ku di reştorana Mîkonos a bajarê Berlîn a welatê Alman de, jialiyê teroriştên hinar-

tiye rejîma Komara Îslamiya Îranê ve, hatne şehîd kiriE-vaku bo me dide xuyakirin ku Dr. Sadiq Şerefkendî jî bo gelê xwe û rêvîngên rêbaxa xwe re bûye rêberêkî hertim zindî û mezintahî û rolê ked û xizmetên wî li pêxema doza berheqe gelê wî de roj bi rojê û sal bi salê û bi taybetî li deve devê salvegera şehîdbûna wî de, zêdetir eyan dibe.

Ev pîvanên ku bûne sedem Dr. Şerefkendî bibe remz û simbola hertimiye bal gel û rêvîngên xwe çine?

*Jidayîkbûyî yê nava malbatekî rewşenbîr û Kurdperwer da ku birayê wî yê mezin helbestvanê binavûdenge Kurd Mamosta Hejare.

* Xwendina bilinde akademîd heya pileya duktorayê li rişta Kîmiya yê de, ku wî serdemî de renga hindî tilyên deşta ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê de, belkî li seranserî Îranê de

jî di asta wî de, xwendin di bi wê pileyê û di wê riştê de çine bin.

* Piştî evê ku weke mamosta destbikar dibe, li ber rolê bilinde Şerefkend û pêgeha bilinde ku di nava gelê xwe de hebû, dikeve jêr zêrevaniyê û li encamê de bi sûçê siyasî bûnê tete dîrêxiştin.

* Dema mijûlbûna xwendina bilin li Firansê û bi berçav-girtina pêgeha bi hêze wî, Şehîd Dr. Qasimlo rêberê mezin, rastewxwe peywendiyê pêre digre û daxwazê jê dike ku bibe endamê Hizba Demokrat û Dr. Şerefkendî jî her vê gavê soza emegdarî û endambûna di Hizba Demokrat de, dide Dr. Qasimlo.

Piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê û aşkera bûna xeba PDKÎ, Şerefkendî bi aşkera tevî refên Hizbê dibe û di heyamekî gelek kin de, pile bi pile Endametiya Kumîta Navendî û Deftera Siyasî dibire û digîje cihê jêhatiyê

xwe, anku dibe cêhگیرê Sekertêrê PDKÎ.

* Raste rêberêkî mezine weke Qasimlo kesê yekimê Hizba Demokrat bû, lê di rastî de eva Şerefkendî bû ku di navxweye Hizbê de mudîriyeta birêve birina hizbê dikir û Şehîd Qasimlo pitir mijûlê karê siyasî û dîplomasî bû, lirasî de bona birêvebirina hizbê tevavkerê Qasimlo bû.

* Şerefkendî kesekî mudîr, micid, sadiq, û qise li rû bû, Mîstefa Hicrî, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştîye PDKÎ dibêje: Şerefkendî wek heval Pêşmerge bû, xakî û xelkî bû, lê li ser karê Hizbê tu heval nas nedikirin û gelek kerbê wî ji kesên tembel û çaplûs diwebû.

* Piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo ku wekî Sekertêrê Hizbê hate hilbijartin, hingê bû ku hêz û şîyan û jêhatîbûna cêhگیرê Qasimlo xûya bû, hingê bû ku di bê Qasimloyî yê de,

erk û karê girane Qasimlo jî kevte ser milê wî, Ev yar û hevkar û emegdarê sadiq Dr. Qasimlo bû û nehêla bê Qasimloyî bi xebatê û Hizba Demokrat ve xûya be.

Ev xalên serve û bêguman gelek xalên dinêye şehîd Dr. Şerefkendî bûn ku xeyala rejîma teroriştperwere Îranê kirne bilqên ser Avê ku rejîmê jêvebû, hekî Qasimlo ji gelê Kurd û Hizba Demokrat biştine, dê bikare şoreşê û îrada Pêşmerge û Rojhilatê Kurdistanê jinav bibe, lê dujmin nedizanî ku ev rêbaza Qasimlo danayî, rêvîng û rêberên wisa tê de hene ku nehêlin xevna dijmin bête cî, Dr. Şerefkendî bo dost û dujminan Qasimloyekî dinê bû.

Her eva bû ku rejîma terorişte Îranê kevte darêtina nexşe û pîlana terorkirina Şerefkendî jî ku mixabin 3 salan piştî şehîdbûna Qasimlo, teroriştên Tehranê karîn destê reş û cinayete xwe bigehînine cihê civîna Dr. Şerefkendî û

hevalê wî, û terora mîkonosê encam bidin.

Lê ev rêbaze û ev xebat û hizba Qasimlo û Şerefkendî, hinde qutabiyên perwerdê destê wan Şehîdan hebûn û hene ku her çavan şerefkendî nehêla piştî Qasimlo xebat rawest, ewan jî piştî Dr. Şerefkendî nehêlane dujmin bigîje armanca xwe û Îro rojê xebata Hizba Demokrat û rêvîngên rêbaza Şehîdan û qutabiyên berdestê Şerefkendî, xevna şevê ji çavê deshilatdarên Tehranê herimandîye û bi avayekî herî bihêz li ser rêveva rastîne xwe û rêbaza Şerefkendî berdwame û sozê didin ku ev jî dê yan armancên bilinde Qasimlo û Şerefkendî bideşt ve bînin, yan ev jî weke wan dê bi serbilindî di vê rêkê de serê xwe danên.

Jîna bû bi remza xebat û berxudanê



N: Zahêd Asadî

Mahsa (Jîna) Emînî keça Kurd ya 22 salî ji bajarê Seqiz a Rojhilatê Kurdistanê ku roja 13'ê meha Îlûnê bi birayê xwe re ji bajarê Seqizê serdana Tehranê kiribû û ji ber ku hîcaba xwe bi awayekî rêkûpêk girê nedabû ji aliyê hêzên ewlehî yê Îranê ve hatibû binçavkirin û raştî eşekneceyê hatibû û di encamê de jî jiyana xwe ji dest da.

Kuştina Jîna Emînî gelek karvedanên berfireh yên li ser aştî navxwe û navdewletî li piştî xwe anîn Ew cinayeta han ya rejîma îslamî a îranê her zû raştî helwêstên tund ya civatgeha Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî hat û civaka Îranê bi hemû rengên xwe ve û nemaze civatgeha navneteweyî ew cinayet û kiryarên hovane a rejîmê derheqê jinan bi tundî şermezar kirin. Di vê deheqê de roja dûşemiyê bi awayekî fermî Koşka Spî canjidestdana Jîna Emînî weke bînpêkirina

emnî a wilat û milîtarîze kirina Kurdistanê, civatgeha azadîxwaz a Kurdistanê bi avayek rijd û bi moralek bilind a azadîxwazî li hember cinayetên rejîmê rawestan û bi girev û xwenîşndanan nayek bihêz gotin rejîmê û dan xuya kirin ku êdî ew li hember cinayetên hovane yên rejîmê bêdeng nabin û daxwzkarê herifina wê rejîma kevneperest û mirovkuj bûn. Îradeya berxudan û mafxwazî a xelkê Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî ji raya giştî a cihanê re da xuya kirin ku xelik çiqas ji wê rejîmê bêzar e. Gelek rêxistinên xwendekaran, sendîkayên karkeran, rêxistinên hiqûqî û yên mafê mirovan banga xwepêşandan û nerazîbûnan kirin ku gel li derve û hundirê Îranê dakevin kolanan û kuştina Mehsa Emînî şermezar bikin. Jîna Emînî ku bi destê xedîr û tawana rejîma Tehranê hat kuştin, êdî Îro bûye beşek ji remz û sembola xebat û berxudanê û gelê me nehêlan ew tawana han bi bêdengî were fetisandin.

kurdên me yên herçar parçên Kurdistanê bi wê bûyera han dilêş re pir xembar bû û herkes bi tundî û bi awayên cur bi cur ew cinayeta rejîma Îranê pirotoste kirin. Rejîma Îranê bi salan e ku cinayetên hovane derheqê gelê me dimeşîne û hewil dide ku bi

eşkere ya mafên mirovan wesif kiriye û ragihandiye, divê Tehran tundûtûjiya li dijî azadiyên sereke, rawestîne. Herwisan wilat û saziyên mafê mirov yên girêdayî yeketiya Ewropa kuştina bi enqest a Jîna Emînî bi destê hêzên Ewlehî yên Îranê ve şermezar kirin û daxwaz ji Îranê kirin ku maşîna xwe ya şepeserî û bînpê kirina mafê mirov bisekinîne û piştgîrî ji xebat û nerizayetiya xelkê Îranê kirin di vê derheqê de.

Saziya mafê mirov a cihanî jî ew cinayeta rejîmê bi tundî şermezar kir. piştî banga hêz û aliyên siyasî yên Rojhilata Kurdistanê û bi taybetî navenda Harîkarî a Hêzên Kurdistanê bo gireva giştî, gelê azadîxwaz û mafxwaz yê Îranê û Kurdistanê bi taybetî, li bajarên Rojhilatê ji bo Jîna Emînî ku bi destê hêzên ewlehî yên Tehranê dibinçavan de bi îşkenceyê hat qetilkirin, grev dukan û bazarên xwe daxistin û daketne kulan û dirûşmên mirin û neman ji bo wê rejîma zalim û mirov kuj a Îranê bilind dikirin û daxwazkarê jînek azad û serbest bûn. Çalakiyên ku ji bo Jîna Emînî li bajarên Îranê jî dest pê kirin.

Bi taybet Tehran û Îsfahanê jî dirûşmeyên "Jin, Jîyan, Azadî" li bajaran deng veda. Serbarê bi ewlehî kirina rewşa

siyaseta asimilasyon û gitin û eşkence kirin û îdam kirinê gelê me tune bike. Lê bila dagîrkerên Kurdistanê baş bizanin ku siyaseta tunekirin û kuştin û girtinê nekariye heya niha jî biserkewe û pêşî ji îraeya mafxwazî a gelê me bigre. Pirsra kurd û arîşe û girêpêçkên civakê bi wî avayê hovane nayên çareser kirin û kurd jî bi wî awayî ji nav naçe. Keç û xurtên wilatparêz û netewexwaz yê Kurdistanê yê Kurdistanê bikin gorîstana dagîrker û neyarên kurdan. Xebat û berxudana kurd heya gehîştin bi azadî û serbêstiya Kurdistanê yê berdewam be.

Ya herî balkêş di bizav û berxudana wê dawiyê a civatgeha Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî, hizûra çalak û bi bandora a jinan bû ku bi dirûşmên jin jîyan azadî, em hikûmeta îslamî naxwazin, mer û neman bo rejîma Îslamî a Îranê, sitûnên zor-darî û kela dîktatorî a rejîma axundî xistin lertzîne. Tex û qatên civakê hemî bi hev re yek reng û yek helwêst nayek bihêz gotin rejîma Tehranê. Bêşik ew xebat û berxudane heya gehîştin bi armancên xwe anku azadî û serbêstiya Kurdistanê yê berdewam be. Kurd yê ser bikewe û Kurdistan jî yê azad bibe.

Li Tirkîyeyê û Bakurê Kurdistanê 4 tifaqên Tirkan hene, lê Kurd bêtifaq in



N: Mîstefa Oziçelik serokê (Par)

Li Tirkîyeyê û Bakurê Kurdistanê gengeşiyên di derbarê Qanûna Bingehîneke Nû û yên di derbarê hilbijartinên Serokomarîyê û Parlamentoyê da her ku diçe hêdî hêdî germtir dibin. AK Partî û MHP (Partîya nîjadperest, faşîst) bi hev ra Tifaqa Cîmhûr ava kirine û nuha li ser hikum in. CHP, İyî Partî (Ji MHPyê cuda bûye), Deva Partîsî (Ji AK Partî cuda bûye), Gel-

ecek Partîsî (Ji AK Partî cuda bûye), Saadet Partîsî, Demokrat Partî wek 6 partîyan ji bo "Sîstema Parlamenterîyê ya Xurtkirî", bi navê "Maseya 6 Partîyan", hevkarîyek ava kirine. HDP ya ku 6 milyon dengên Kurdan digire, lê xwe wek "Partîyeke Tirkîyeyî" pênase dike, li gel 5 partî û rêxistinên Çepên Tirkan bi navê "Tifaqa Ked û Azadîyê" tifaqek ava kirîye. 4 Partîyên Çepên Tirkan jî bi navê "Hevkarîya Sosyalîst" tifaqeke din ava kirine. Ev herçar tifaq jî zêdetir tifaqên ji bo hilbijartina ne. Tifaqa Milet jî, Tifaqa Cîmhûr jî paradigmayê "Yek

dewlet, yek millet, yek welat, yek al"ê diparêzin. Di Qanûna Bingehîn a Tifaqa Milet da jî, di ya Tifaqa Cîmhûr da jî herçar madeyên ewil ên Qanûna Bingehîn a nuha tene parastin. Van herçar xalên ewil ên Qanûna Bingehîn, hebûna milletê Kurd, zîmanê kurdî, hemû mafên neteweyî, demokratîk, kolektîf yên kurdan tune dihesibînin, qedexe dikin. Tifaqa Cîmhûr û Erdogan dibêje "Me pirsra Kurd çareser kirîye" û tu mafên Kurdan qebûl nakin. CHP û hevkarên xwe yên Tifaqa Milet, Deva Partîsî, Gelecek Partîsî dibêjin "Emê pirsra Kurd çareser bikin"; lê ji bilî çend

gotinên glover, ji bo terîf kirin û çareser kirina pirsra Kurd û Kurdistanê, heta nuha tu bername pêşkêş nekirine. Hinek partîyên wek CHP, Deva Partîsî, Gelecek Partîsî car caran behsa "mafê zîmanê kurdî" dikin lê ne dîyare ku ev maf çi maf e û di bernameya 6 partîyan de bi tu awayî behsa kurdan û zîmanê kurdî nekirine. Tifaqa Milet jî, Tifaqa Cîmhûr jî, nasnameya kurdî, perwerdeya bi zîmanê kurdî û tu mafên Kurdan nexistîne nav bernameya xwe. Herdu alî jî, ji ber ku kurdan bêxwedî dibinin, bi bêminetî tevdigerin, daxwazên kurdan qebûl

»»» Doma R:4

nakin û dixwazin vê sîstema ku 99 sale berdewame her bi vî rengî bimeşînin.

Sîstema Dewleta Tirkîyeyê, dixwaze gelê Kurdiştanê mecbûrî ji van herdu alternatîfan yekê bike, ku armanca herduyan jî paraştina Dewleta Tirkîyeyê ya heyî û berdewamîya sîstema dagirkerîyê ye. Tifaqa Ked û Azadiyê ya ku HDPyê li gel 5 partî û rêxistinên çepên tirkan ava kiriye û Hevkarîya Sosyalîst a 4 partî û rêxistinên çepên tirkan di navbera xwe da ava kirine, di deklerasyonên xwe da, di derbarê terîf kirin û çareserîya pirsê Kurd û Kurdiştanê da û ji bo daxwazên acîl yên kurdan, tu tişt nivîsandine. Bes dibêjin “Emê pirsê Kurd bi rêyên demokratîk çareser bikin”. Partiyên Dewleta Tirkîyeyê mirinê nîşanê kurdan didin, dixwazin wan mecbûrî taya sar bikin

Komara Tirkîyeyê di sala 1923yê de hate damezrandin. Ji sala 1923yê heta 1946ê yek partî CHP(Partîya Komarî ya Gel) ku serokê wê Muştâaf Kemal Atatürk bû, li ser hikum bû. CHP damezranêr û mesûlê esasî yê sîyaseta “Yek dewlet, yek millet, yek welat, yek al”ê û berpirsê sîyaseta û kiryarên asîmîlasyon, înkâr û îmhaya milletê Kurd e. Berpirsê qetîl kirina bi deh hezaran Kurda ne. Piştî sala 1946ê li Tirkîyeyê Partîya Demokrat hate damezrandin û ew jî beşdarî hîlbijartinan bû. Damezranêrên Partîya Demokrat jî her ew kadroyên ku ji CHPyê bûn û Kemalîst bûn, partîya Dewleta Tirkîyeyê bû. Piştî sala 1946an, sîstema Dewleta Tirkîyeyê, kurd mecbûrî wê yekê kirin ku, her dengên xwe ji van herdu partîyan bidine yekê. Paşê jî hinek partiyên din ku ew jî partiyên ku ji bo berjewendiyên Dewleta Tirkîyeyê hatibûn damezrandin û CHP û ew partî her bûn rikberên hev. Ji sala 1946an ve heta îro, Dewleta Tirkîyeyê Kurd her mecbûr kirine ku her dengên xwe bidine “ehvenî şer”ê, angî “ji nav xeraban , başê xeraban hîlbijêre”. Ji sala 1946ê ve heta îro, her partîyeke desthilatdar bi sîyaseta û kiryarên xwe weha kirîye ku, kêrê daye heştî û Kurd her carê ketine rewşeke weha da ku bibêjin

“Bila ev hikûmet, ev desthilatdarî here, kî tê bila were”. Di encamê da dengên Kurdan di guhertina hikûmet an desthilatdarîyê da roleke esasî lehîstîye, lê ji destpêka sîstema pirpartîtiyê heta îro tu mafên kurdan ji aliyê tu hikûmetê, tu partîyê ve nehatine qebûl kirin, di Qanûna Bîngehîn da nehatine bicîh kirin. Nuha jî , bi taybetî di sîsteme serokatîyê da, dengên kurdan dibe dengên tayînkê. Û deshîlat jî, mixalefet jî, dixwazin Kurdan bixin nav vê xelekeya teng, ku bêtî tu mafên kurdan bêbicîh anîn, Kurd dengên xwe bidine Tifaqa Cîmhûr an jî Tifaqa Mîlet û di encamê da Kurd dîsa her dest vala derkevin. Angî mirinê nîşanê kurdan didin da ku Kurd bi taya sar razî bibin.

Di navbera salên 2002 û 2010ê da AK Partîyê di derbarê dîsa bîjarte ya Kurdî, TRT-Kurdî û di 5 Unîwersîteyan da Beşê Zîmanê Kurdî da hinek gavên erênî avêt û bi piranî kurdan piştgirîya van gavan kirin. Lê AK Partî nuha li gel partîya nîjadperest MHPyê, dijayetîyeke gelekî tûnd li himberî milletê Kurd dimeşîne û van gavên ji bo kurdî hatiine avêtin yek jî di yasayên Dewleta Tirkîyeyê da nehatine bicîh kirin, wek gavên fîlî tene meşandin. Tecrubeyên heta îro nîşan dane ku, heta Kurd wek aliyekî tevnegerin û bi yekdengî li daxwazên xwe yên neteweyî xwedî dernekevin, bi yek helwestî hêza xwe nîşan nedin, mixabin dê nikaribin tu mafên xwe bideşt bixin, dê nikaribin destkeftinên xwe biparêzin, dê nikaribin tesîrê li ser helwesta van tifaqan, van partîyan bikin, dê nikaribin tesîrê li ser guhertinên Qanûna Bîngehîn bikin û dê nikaribin sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya di derbarê kurdan da biguherînin.

Parlamento ne cîhê çareserîyê ye, lê divê di hîlbijartinan da em gelê xwe bê alternatîf nehêlin

PAK di sala 2014an da wek partîyeke yasayî li Tirkîyeyê û li Bakurê Kurdiştanê hate damezrandin. Her çiqas Dadgeha Qanûna Bîngehîn di sala 2019an da di derbarê PAKê da doza

daxîstîne(girtîne) vekiribe jî, ev doz hîna berdewam e û PAK wek partîyeke yasayî jî xebatên xwe dimeşîne. Pirsên wek pirsê Kurd û Kurdiştanê pirsên neteweyî, niştîmanî ne û bi qebûl kirina Dewleta Tirkîyeyê û nûnerên gelê Kurdiştanê, bi çavdêriya dewletên cîhanê , bi guftûgo û muzakereyên herdu alîyan, li ser maseyê dikare bê çareser kirin.

Aşkereye ku, bi wê sonda parlamenterîyê û bi vê hiqûqa navxweyî ya parlamentoyê, bi Qanûna Bîngehîna Tirkîyeyê ya ku hebûna kurdan jî qebûl nake, bi vê sîstema parlamenterîyê û yasaya partîyan, bi yasa û sîstema hîlbijartinan û hemû yasayên ku li Tirkîyeyê hene, Parlamentoya Tirkîyeyê nikare bibe cîhê çareserîya pirsê Kurd û Kurdiştanê. Li Parlamentoya Tirkîyeyê axaftina Kurdî jî tê asteng kirin û gava ku parlamenterek bi Kurdî diaxive di dokumentên parlamentoyê da weha tê qeyd kirin “Fîlan parlamenter bi zîmanekî ku kes nizane çî zîmane, zîmanekî nenas axivî”.

Lê helbete ku ev nayê wê wateyê ku emê hîlbijartinan tune bihesibînin û di hîlbijartinan da gelê xwe bê alternatîf bihêlin. Li Bakurê Kurdiştanê û li Tirkîyeyê ji %84ê dengderên Kurd beşdarî hîlbijartinan dibin. Divê em vê rastîyê jî paşguh nekin û divê em ji gelê xwe ra bêjin “hîlbijartin û parlamento ne cîhê çareserîya pirsê Kurd û Kurdiştanê ye”, lê divê em gelê xwe bê alternatîf jî nehêlin. Em dikarin xwedî çend alternatîfên cuda cuda bin. Em li gorî şerd û şîrûd û hêza xwe dikarin hîlbijartinan boykot jî bikin. Em dikarin beşdarî hîlbijartinan bibin û behsa doza meşrû ya milletê kurd bikin û heger em biserketin, em dikarin sonda parlamenterîyê nexwin. Hinek ji parlamenterên Kurd dikarin di parlamentoyê da jî paraştina doza azadîya Kurdiştanê bikin û ji bo bicîha anîna daxwazên acîl ên milletê Kurd parlamentoyê jî wek platformeke têkoşînê bi karibin bikar bînin. Divê em di meseleya hîlbijartinan û parlamentoyê da bes bi alternatîfa reş û sipî li meseleyê

nenêrin; divê em bikaribin li ser berjewendî û prensîbên milletê xwe, helwestên cuda cuda li gorî şerdan bihînin.

PAKê di hîlbijartinên 2015 û 2018an de, xwest li ser prensîbên bîngehîn ku ji daxwazên acîl ên milletê Kurd pêk tên, li gel HDPyê tifaqa hîlbijartinê pêk bîne. Lê mixabin HDPyê xwe neda ber wê yekê ku , li ser prensîban li gel PAKê tifaqeke hîlbijartinê pêk bîne.HDPyê dixwest çend parlementeran bide PAKê, bêtî ku tifaqeke li ser prensîban hebe. Lê PAKê di herdu hîlbijartinan jî ev helwesta HDPyê red kir û got “Heger li ser prensîban tifaq nebe, em rast nabînin bes ji bo çend parlementeran tifaqeke hîlbijartinan pêk bînin”. Ev peywendiyên PAKê û HDPyê bi awayekî aşkere bi agahdarîya raya giştî ya Bakurê Kurdiştanê pêk hatine.

Bicîhanîna daxwazên acîl ên milletê kurd, dikare ji çareserîya pirsê Kurd û Kurdiştanê ra rê xweş bike Îro, di demeke ku li Tirkîyeyê û li Bakurê Kurdiştanê guhertina Qanûna Bîngehîn tê minaqeşe kirin û hêdî hêdî atmosfera hîlbijartinên parlamentoyê germ dibe, divê em wek Kurdên Bakurê Kurdiştanê û yên li Tirkîyeyê dijîn xwedî bername û sîyeseteke hevîrtî bin. Divê em nebin dûvik û pêlika Tifaqa Cîmhûr jî, ya Tifaqa Mîlet jî. Em wek aliyê kurdan divê di derbarê guhertinên di Qanûna Bîngehîn da xwedî pêşniyarî û helwesteke hevbeş bin.

Me wek PAK(Partîya Azadîya Kurdiştanê), PSK(Partîya Sosyalîst a Kurdiştanê), TDK-TEVGER(Tevgera Demokratîk a Kurdiştanê) ji bo daxwazên acîl ên milletê kurd me bernameyek dîyar kirîye, pêşkêşî gelek partiyên sîyasî, dezgehên sîvîl û kesayetên kirîye û em dixwazin potansiyela herî berfireh a Kurdên li Tirkîyeyê dijîn û kurdên Bakurê Kurdiştanê li dorê wê bernameyê hêza xwe bikin yek û di guhertinên Qanûnên Bîngehîn da bibin terefek.

Bernameya Daxwazên Acîl ên Milletê Kurd bi kurtayî ji van xalan pêk tên: Bila nasnameya Kurdan, mafê perwerdeya bi zîmanê Kurdî, fermîbûna zîmanê Kurdî bê qebûl kirin. Bila qedexeyên li ser navê Kurdiştanê û qedexe û astengiyên li ber partiyên bi navê Kurdiştanê bêne

»»» Doma R:5

rakirin. Divê hemû astengî û qedexeyên li ber azadîya ramanî û rêxistinî ji holê rabin û van hemû maf û azadî di Qanûna Bingehîn a Tirkîyeyê da bêne bicîh kirin. Bila hemû kesên ji ber xebatên xwe yên siyasî, rewşenbîrî, çalakîyên sîvîl û ji ber nivîs û berhemên xwe yên hunerî di hefsan da ne bêne berdan, divê hemû dozên bi vî rengî ji holê rabin. Bila


Dewleta Tirkîyeyê hemû peymanên navneteweyî yên ku îmze kirîye bicîh bîne, şerhên ku danîye ser van peymanan rake. Bila madeya 90î ya Qanûna Bingehîn a Tirkîyeyê bê bicîhanîn.

Belê em dibêjin her kurdekî ku ji serxwebûnê, konfederasyonê, federasyonê, otonomîyê, sîstema eyaletê ya bajaran an bes mafên ziman û kulturî, kîjanê jî biparêze,

dikare li ser ve Bernameya Daxwazên Acîl ên Miletê Kurd hevkarîyekê ava bikin. Kurd bikaribin li ser van daxwazên acîl hêza xwe bikin yek, dikarin ji Dewleta Tirkîyeyê ra, ji Tifaqa Milet û Tifaqa Cîmhûr ra, ji her alîyekî peywendîdar ra bêjin “Kîjan alî van daxwazên me yên acîl bixe bernameya xwe ya hîlbijartinê û garantî bidin ku di Qanûna Bingehîn

da van daxwazan bicîh bikin, em amade ne bi wan ra rûnîn û guhtûgo bikin”. Îro ev bernameya daxwazên acîl, bernameyeke ku dikare pêk bê. Hevkarîyeke li ser daxwazên acîl ên miletê Kurd, dê hêza kurdan xurtir û berhemdartir bike, dê rê ji çareserîya pîrsa Kurd û Kurdistanê ra xweştir bike.
17.09.2022
Muştafa Özçelîk

Mes'ûd Tek serokê PSK li Bakûr: “Dr. Sadiq Şerefkendî yek ji zanatirîn Endamê Deftera Siyasî a HDKÎ û yek ji nêzîktir û jêhatitîrîn hevkarê şehîdê nemir Dr. Qasimlo bû.”



Mes'ûd Tek serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê

Min digel rêzar Mes'ûd Tek sekreterê Partiya Sosyal Demokrat a Kurdistanê li Bakûrê Kurdistanê li derheq çawaniya naskirina şehîdê nemir Dr. Sadiq Şerefkendî, hevpeyvîn pêk anî navbirî wiha got: Pêşmerge û kadrên siyasî yên HDKÎ behsa Dr. Saîd dikirin, wekî yek ji zanatirîn Endamê Deftera Siyasî a HDKÎ, yek ji nêzîktir û jêhatitîrîn hevkarê şehîdê nemir Dr. Qasimlo, min ev wiha nas kir.

P:Kek Mes'ûd Tek we çawa şehîdê nemir Dr. Sadiq Şerefkendî nas kir?

B:Gava di 12ê Îlonê sala 1980'an da li Tirkîyê kudutaya leşkerî çêbû, hinek endam û aligirên partiya me pena birin Kurdistanê Rojhilat, ku hingê di bin kontrola Hizba Demokrat Kurdistanê Îranê da bû. Ez jî yek ji wan bûm. Hingê min navê Dr. Sadiq Şerefkendî (Dr. Saîd) dibihîşt. Pêşmerge û kadrên siyasî yên HDKÎ behsa Dr. Saîd dikirin, wekî yek ji zanatirîn Endamê Deftera Siyasî a HDKÎ, yek ji nêzîktir û jêhatitîrîn hevkarê şehîdê nemir Dr. Qasimlo. Di dawîya sala 1981'an da, ku me neçarî navçeyê soma-Biradoşt çol kir û hatin min-tiqayê derdora Mehabadê,

hingê hatin û çûyina me bo Deftera Siyasî ya HDKÎ zêdetir bû. Di wan hatin-çûyan de min nêzik ve Dr. Saîd wekî mirovekî ruken, xakî û xweşsuhbet naskir.

P:Rêzdar Mes'ûd, rola Dr. Sadiq li ser tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê çawa bû?

B:Bi gor bîr û bawerîya min li ser vê babatê axaftin û gotinên zêde pêwîst nake. Ji ber ku Dr. Saîd şongirî serokê nemir Şehîd Dr. Qasimlo ye, ku hingê wekî mamosteyê demokrasî û dîplomasiyê dihat naskirin û yek ji siyasatmedarên bi navûdengê navçeyê Rojhilatê Navîn bû û di seranserê cîhanê dihat naskirin. Bê guman dagirtina şon û valahiya serokê usa ne hêsan e, ku Dr. Saîd dikarî di demekê kurt da şona Qasimloyê tijî bike û nehişt, ku teror kirina Dr. Qasimlo bandoreka xirab li ser hêzên Pêşmerge û refên HDKÎ da dayne. Li jêr serokatiya Dr. Saîd û hevkarên wî da HDKÎ xwe rêk û pêktir kir û xebata HDKÎ pêşve çû.

P:Rêzdar Mes'ûd çima rejîma Îranê her piştî terorkirina Dr. Qasimlo demldest pîlana terorkirina Dr. Sadiq darêt?

B:Kar û pişeyê hemu rejîmên Îranê her eva bûye. Karbidestên dewleta dagirkerê Îranê hertim hewl dane, ku bi kuştina serok û rêberên Kurd ve pêşiya xebata azadî û demokrasîyê bigrin. Lê dîrok nîşan daye, ku hemu xevn û xeyalên wan di vî warê da pûç bûye. Gava bo rejîma axundên

Îranê eyan bû, ku bi şehîd kirina Dr. Qasimloyê nikarî bû pêşiya xebata HDKÎ bigre, bi teror kirina Dr. Qasimlo ve ne tenê soreşa gelê Kurdistanê Rojhilatê têkneçûye, her usa rêk û pêktir û bi hêztir bûye, hingê dest bi amade kirina plana kirêt a nû kirine.

P:Dr. Sadiq di perwedehiya hêza Pêşmerge de çawa bû?

B:Min Dr. Saîde wekî siyasatmedarek û niviskarek naskir ne wekî fermande û kadrê leşkerî. Lê belê di vî warê da bûyerek li bira min da maye. Paş êrîşa berbelavê rejîma axundan HDKÎ neçar ma bikeşe Kurdistanê Başur. Navçeyê azadkirî di destê hêzên Pêşmerge nemabû û tevliheviyek di nava refên Pêşmerge da rûdabû. Hingê Dr. Saîd kete kar û paş kar û xebata Dr. Saîd hinek pêşmerge, bi dilxwaziye xatir ji şoresê xwaştin û vegeyriyan gundê xwe. Di demekê kurt da refên Pêşmerge hat rêk û pêk kirin, ku bê guman di vê serketinê da rola şelgiriya Dr. Saîd gelek girîng bû.

P:Dawîn pirsyar rêzdar Mes'ûd Tek, piştî desrbasbûna 30 salan li ser şehîdkirina Dr. Se'îd Şerefkendî hûn berdewamkerên rêbaza wî çawan dibînin?

B:Bersiva pîrsa hanê di belavoka partiya me da, ku me bi boneya 30. Saliya şehîd kirina Dr. Saîd belav kiribûn, heye. Baştir e ez vê belavokê binim bira xwendevanên rojname Agirîyê: “Şehîd Dr. Şerefkendî Nemir E 30 sal berê niha, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê (HDKÎ) Dr.

Sadiq Şerefkendî (Dr. Saîd) ligel du hevrên xwe Fettah Abdulî û Humayun Erdelan ve, li Berlînê, ji aliyê terorîstên ser bi Rejîma Cumhuriyeta Îslamiya Îranê ve hate şehîd kirinê. Herwekî biryara Dadigeha Berlînê jî destnîşan kiriye, berpîrsê şehîd kirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî rejîma Cumhuriyeta Îranê ye û terora hersê tekoşerên Kurd ji aliyê dezgeyên fermiya vî rejîmê ve hatiye amade kirinê. Xeyala rejîma Îranê ev bû ku bi şehîd kirina serok û rêberên tevgera Kurd li Kurdistanê Îranê wekî Simkoyê Şîkak, Qasimlo û Şerefkendî, dikare pêşiya xebata azadixwaziya gelê Kurdistanê Rojhilatê bigre. Lê belê, wekî roj eyan e, xebata kadr û pêşmergeyên HDKÎ û hevsengerên şehîdan hemu xevn û xeyalên dewleta dagirker a Îranê pûç kirin û nehiştin, ku rejîma Cumhuriyeta Îranê bigihîje armancê xwe yê kirêt û alayê xebatê şehîdan bilind ragirtin û radigrin. Em carekî dinê teror kirina Dr. Saîd û hevalên wî mehkum, rejîma Cumhuriyeta Îslamiya Îranê, ku plangerî vî terore bû, rûreş dikin. Em piştraşt in, ku hevsenger û şagirdên Dr. Saîd, rêvîngên rêbaza Pêşewa ku, çend roj berê bi hevgirtinê xwe ve mizgîniya serketinê dane, çol nakin.

Carekî dinê li ber hizura Dr. Şerefkendî û hizura hemû şehîdên Kurdistanê kirnoş dibin.

17ê Îlon 2022
PSK-Partiya Sosyalîst a Kurdistanê

Nerîna Lîderan



Ebru Gunay:
Serhildana Rojhilatê Kurd-
istanê roj bi roj li her derê
belav dibe



Rafael Grossi:

Eger Îran rê bide em dê di
çend mehan de pişkinînên
xwe temam bikin



Joe Biden:

Em li kêlega jinnê Îranê raw-
estane



Liz Truss:

Heta ku Ukrayna bi ser
nekeve em ê rehet nebin

Nerazîtiyên piştî şehîdbûna Jîna, referandûma serxwebûna Rojhilat in!



N: Eskender Ceiferî

Xwepêşandanên vê dawiyê
yên li dijî rejîmê jî weke
cejna netewî ya Newrozê
bûne remza şoreşê. Di dîroka
hevçerx de, ti yek ji wan
deştîlatan ku Kurdistan
dagir kirine, nexwaştine li-
hevciwîna Kurdan bi rengekî
ciddî were pêşwazîkirin.
Rojhilatê Kurdistanê jî parek
ji vî welatê birîndar e. Ko-
mara Îslamî, weke rejîma
Pehlewî, riftarê bi Kurdan re
dike û lehengên Kurdan tenê
ji ber pêkanîna çalakiyekê bi
dehan salan di girtîgehan de
dimînin.

Aliyên siyasî ên Ro-
jhilat, herî dawî li ser
xwepêşandanên girseyî ji bo
şermezarkirina şehîdkirina
Jîna Emînî lihev hatin. Belkî
ev, zengila metirsiyê be ji
Komara Îslamî re. Ji Ber ku
heya niha ti caran bi vî rengî,
hemû partiyên nasyonalîst û
komonîst ên Rojhilatê Kurdis-
tanê li hev nêzîk nebibûn.

Rejîma Komara Îslamî a
Îranê, tevgera partiyên Ro-
jhilatê Kurdistanê bi hûrî
dişopîne. Heta partiyêke
Kurdî bikare hevrêziyê di
nava refên aliyên cuda de
pêk bîne, Komara Îslamî jî
nîgeran e.

Piştî biryara han a pêşwaziya
meşên şermezarkirina
şehîdkirina Jîna ji aliyê
partiyên Kurdî ve, tevger-
eke mezin di nava Spaha
Pasdarên Îranê de çê bûye.
Ew ditirsîn vî carê Rojhilatê
Kurdistanê hemû hevdeng
rabe ser piyan. Zanyari-
yên veşartî ji nava Spahê
amaje dikin ku bajarên Sine,
Ormiye û Kirmaşanê bûne



armanca sereke a hêzên
wê rêxistina terorîst. Bi vî
rengî ku endamên Sipahê, di
nava xelkê sivîl de digerin
û neyaran didin nasandin û
biryar e her kesê ku behsa
xwepêşandanê hevpar a ali-
yên Kurdî bike, bê girtin.
Ji xwe heya niha dehan kes
jî hatine kuştin û sedan kes
hatine girtin.

Ji xeynî tevgerên Spaha
Pasdaran, selefî jî li hemberî
nasyonalîstan tene çalakkirin.
Plana herî dawî a Îranê ew
e ku derfetê bide rêxistinên
tundrew da ku nasyonalîzma
Kurdî di landikê de bife-
tisînin. Li gora zanyariyên
çavkaniyêke veşartî a saziya
Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê,
eger tevlihevî an jî serhildana
xelkê û partiyên Rojhilat li
hemberî deştîlat çê be, dibe
ku ji bo dijatiya hêza Kurdan,
mifah ji aliyên selefî jî were
wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku
li Rojhilatê Kurdistanê di
encama nebûna derfetên kar
de dibin kolber, bilind dibe.
Rêjeya kuştina kolberan, gir-
tina Kurdan bi tometên siyasî
û herwisa rêjeya darvekirina
welatiyan zêde dibe. Tepisan-
dina xelkê berfirehtir dibe lê
dîsa jî xelk guh nade rejîmê.
Her sal qedexetî dikeve ser
pêkanîna rêwresma Newrozê
lê tevî vî jî xelk cejna xwe
pêk tîne û slogana partiyên
xwe li dijî dîktator, hildide.
Her rabûnek, ji bo Kurdan
referandûmeke serxwebûnê
ye ku li dijî Tehranê li hemû
navçe, gund û bajaran pêk
tê. Aliyên siyasî ên Rojhilatê
Kurdistanê wisa dibînin ku

qet li Îrana di bin deştîlata
Komara Îslamî de, hilbi-
jartineke demokratîk û azad
birêve neçûye û ew hertim
hilbijartinê baykot dikin.

Li gor wan, her sal Kurd di
nerazîtiyên xwe de li hemberî
rejîmê, biryara xwe li dijî
dagirker diştînin û soza xwe
bi rîya şehîd û cangoriyên
niştîman re nû dikin.

Niha, referandûma serxwe-
bûna Rojhilatê Kurdistanê,
ji aliyê tevahiya partiyên di
nav Navenda Hevkariyê a
Partiyên Kurdistanê Îranê
ve bi rêve diçe. Her yek ji
wan, sloganekê ji bo azadiya
niştîman hil dide. Taktîk jî
cudane. Lê armanca hevpar,
bûye sedem da ku hemû,
hevdeng, bang li neteweya
Kurd bikin heya dakevin
kolanan û dilê dagirker bi-
hejînin û car din jê re bêjin
ku evder welatê me ye û em
ji bo pêkanîna tevgeran li
ser axa xwe, îznê ji ti kesekî
naxwazin û rabûna me, dengê
dijatiya me a li hemberî da-
girker e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûy-
an deşt dane hev û ji Agirî,
heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn
heya Arbaba û ji Dalaho heya
Qelaçolan, dengê pêşmerge
di nav keç û xortên Kurd de
reng vedide û ewê bi tîrêjên
agir û rojê û bi qêrînên
dilên dayîkên şehîdan herin
pêşwaziya xwepêşanderan
û zêdebarî hemû rêwşûnên
tund ên ewlehî ji aliyê rejîmê
ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê
re germ e û referandûma me
wê birêve biçe

»»»» Doma R:9

Zêdebûna metirsiyê li ser Rojavayê Kurdistanê



N:Ebdûlazîz Qasim

Metirsî li ser çarenivîsa gelê kurd yê Rojavayê Kurdistanê, her ji demê dest-pêkirina civînên sê alî yên di navbera Îran, Tirkîyê û Rûsiyê de, ji sala 2017an ve heta niha, roj bi roj zêdetir dibin, bi taybetî ji aliyê Tirkîyê û komên çete û terorişt yê girêdayî opozîsyona Sûriyê, wek me dît ku metirsiyek zêde li ser Rojavayê Kurdistanê peyda bû, yekser piştî civîna sê-alî di navbera Rûsya-Îran-Tirkîyê de, ya bi navê civîna Tehranê di 19ê Tîrmehê de, nemaze piştî nêzîkbûna di navbera rêjîma Sûriyê û Tirkîyê de, ku derbarê vê yekê hewlên praktîkî ji aliyê Rûsiya û Îranê dibin

ji bo nûkirina têkiliyên bihêz di navbera Enqere û Şamê de.

Careke din, civîna welatên Rêxistina Hevkariya Şanghayî ya li paytexta Ozbekîstanê Semerqendê di 19'ê êlûnê de hatî lidar xistin, bû derfetek ji bo hevdîtinên serokên her sê dewletên navbirî.

Endamtiya Îranê di nav Rêxistina Hevkariya Şanghayî de û herwisa pejirandina endamtiya Tirkîyê wekî Hevparê Dîyalogê” yan “Çavdêr” metirsiyek mezin netenê li ser Rojavayê Kurdistanê çê dike, belkû pîrsa kurdî li tevaya Kurdistanê dixe dibin metirsiyê de, ji ber ku ji Rûsyayê, hin dewletên din yê zilhêz hene wekî Çîn, Hindîstan, Qazaxîstan, Tajîkîstan, Qirgîzîstan, Ozbekîstan, Pakîstan û welatên din hene, axaftina serokê Rûsyayê bi damezrandina “navendên nû yê bandorê”, nîşanek din ya metirsîdar dide xuyakirin, ku îro pêdiviya tevgera siyasî û leşkerî ya kurdî bi xwendinek nû û

pêdaçûnek kûr heye, wekî xuyaye ku di rojên pêş de, hevahingî û hevkarîya di navbera Rûsiya, Tirkîyê û Îranê de bi taybetî li ser Sûriyê dê zêdetir û bihêztir bibe, nemaze ku Serokê Rûsiyayê Putîn gelekî pesnê rola Tirkîyê bi ernî nirxand bi taybetî di kirîza Ukrayna de (wekî axaftina wî).

Tevgera kurdî li Rojavayê Kurdistanê pêdivî bi hin gavên lez û girîng heye, di serî de pêdivî bi tifaq û yekrêziya kurdî heye, ji bo pêkanîna yekrêziya kurdî pêdivî heye bi rakirina sedemên nakokî û cudahiyan û bi taybetî rakirina sedemên koçbariyê, wekî rakirina leşkerîya neçarî, revandina keç û zarokan, peydakirina derfetên kar û xwendinê û serbestberdana girtiyên siyasî û rakirina biryarên şaş yê hatine spandin bi awayekî bêserûber li ser civaka kurdî ...hd.

Derbarê vê yekê hewce heye em amaje bi pêvajoya yekgirtinê ya Partiya Demokrata Kurdistan- Îranê bikin, ku

ev yekgirtinê di vê qonaxa hişyar de, bi hesetek mezin ji berpirsyaretiya dîrokî û neteweyî tê nirxandin, ji ber ku pêdiviya bihêzkirina rola tevgera Kurdî ya rizgarîxwaz û misogerkirina mafên gelê kurd bi gavên wisa li Rojavayê Kurdistanê heye, tevî ku heta niha ti îradeyek raşteqîn li Rojavayê Kurdistanê ji bo pêkanîna yekrêziya kurdî nîne, bêtir ku roj bi roj “Dikanên Hizbî” li Rojavayê Kurdistanê zêdetir dibin ku hejmara wan gihiştiye nêzîkî 80 partiyên perjewendîxwaz yê bûne bela, piştî û bar li ser milê miletê kurd û doza wê ya neteweyî.

Hêjayê gotinê ye ku tevgera kurdî li Sûriyê, ti rengê serweriyekê yan biryarek serbixwe bidest nemaye, û zêdebarî zalbûna hin kesên bêşiyar, berjewendîxwaz û gendalkar zêdetir ji deh salan ve li ser doseyan girîng û heştyar yê girêdayî pîrsa Kurdî, ku li gorî berjewendiyên xwe yê kesane bi çarenivîsa kurdên Rojava dilehîzin bêyî hiç heştek yan jî berpir

Li Kurdistan û Îranê mangirtina seranserî destpê kir

Iro 28'ê Xermananê li Kurdistan û Îranê xelk bona li hember derketina qetla hikûmetî ya Jîna Emînî ji aliyê hêzên geşta îrşad ve, dest havêtin bi mangirtina seranserî.

Li bajarên Kurdistanê yê weke Sine, Merîwan, Mehabad, Bokan Urmiye, Seqiz, Bane û Şinoyê, welatîyên bivêr û biemeg yê Kurdistanê, bi daxistina dukan û bazaran dest havêtin bi mangirtina seranserî, û bi wi awayî li hember qetla hikûmetî ya Jîna Emînî bi destê hêzên xwînmij yê geşta îrşadê ve rawestan.

Hêjayê behskirinê kirinê ye ku li bajarê Seqizê welatîyan bona piştevanîkirin ji malbata Jîna Emînî û rawestan li



hember hovîti û dirindehiya hêzên xwînmij yê geşda îrşad di piroseya mangirtinê de heta xwaringeh jî daxistine.

Her di vê pêwendiyê de, şeva derbasbûyî 27'ê Xermananê li bajarê Sine ciwanên xwîngerm û bicoş li çar rêya Jandarmêrî ya wî

bajarî de, li hember qetla hikûmetî ya Jîna Emînî ji aliyê hêzên geşta îrşad ve posterên wêneyên Welî Feqîh dirandin.

Li bajarê Urmiyê li Balanîş û cem sîloya genim welatîyan bi daxistina dukan û bazaran dest havêtin bi mangirtina seranserî.

Her di vê pêwendiyê de xelkê bi emeg û bihêr yê bajarê Dîwandere jî bi daxistin bazar û dukanan li hember hovîti û neîdaletiyên hêzên serkutkar yê rejîmê û qetla hikûmetî ya Jîna Emînî bi destê hêzên xwînmij yê geşta îrşadê ve, tevî mangirtina seranserî bûn.

Navendên ewlehî û leşkerî yê rejîmê bi givaş xistin li ser welatîyan hewl dide bi zorê dukan û bazaran vebikin lê welatîyên bivêr û nîştimanperwer li ser mangirtina seranserî berdewamin.

Herwisa rejîma Îranê ji bo ku pêşî girtin ji mangirtina seranserî li bajarên Kurdistan û Îranê de di nav bazaran hêzên ewlehî bi kincên şexisî û leşkerî cihgîr kirine.

Hîcab, bilêta erzan a bihuştê



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

Yê ku hinek kûr hizr kiri-be piçek li Qora'ana pîroz şarezayî hebe divê bizane ku li ti kinkeke Qora'anê de nivîsek bi eşkere behsa deşt-mal an xwawikê bo dapoşîna porên jinan kiribe, tev ya heyî îctihadî û fuqehaye, belkû ti beşek nine li şerî'eta Xweda, beşeke li şerî'eta fuqehayan ku bo hêvî û berjewendiyên xwe tînin. Piştîre bi kêmek şarezayî li zimanê erebî tê digihîjin ku peyva (hîcabê) ti demî wateya dapoşîna ser nine bitaybet serê jinê, yaku heye peyva (calbab) xwaştin ku, bo jin bi wateya dapoşînekekê ye ku li ştûyê mirov de. Dadipoşe heta xwarê, neku ser. Bilî vê ku Xwedayê mezin hîcab nekiriye merc bo îmandariya jinan û tundîtîjî pêwendî bi Xweda ve heye, eger wisa be dibe bibêjin hîcab ti demî tak-tîka kêman nixr nine bo dojah û ser rûtkirin jî wateya vê yekê nine ku çarenivîsa wan jinan dojah an hemen cihenem, çimkû mesela îmandariyê çendîn stûnên din heye ku ez bawer nakim hemû jinek xawikê li serê wê û dapoşînek jî karibe tev cî bi cî bike bo vê ku biqewlê wan bixwe dojahê ji xwe re barimte bikin.

Ayeta 31 li soreya Nûr dibêje: “وَقُلْ لِلْمُؤْمِنَاتِ يَغْضُضْنَ مِنْ أَبْصَارِهِنَّ وَيَحْفَظْنَ فُرُوجَهُنَّ

.. ولا يبدين زينتهن الا ما ظهر منها .. وليضربن بخمارهن على جيوبهن ..” ولا يبدين زينتهن الا لبعولتهن او..تاد wate: Xweda ji jinên îmandaran re ferman dide ku çavên wan li asta wan tiştên ku wan bê îman dike sernîştîv bikin û wate tiştê di nav lingê xwe de biparêzin bi wateya dapoşîne ye, îca “وليضربن بخمارهن على جيوبهن”

wate serpoşîn ku bidin li ser “جيوبهن” tiştê singê xwe de, êdî li kuderê de behsa xawikê hatiye bo dapoşîna serê jinê? Îca li hemen sorê de li ayeta 30 îşare bi mêran kiriye û bi hemen şêwazî ji wan re ferman dide: “قُلْ لِلْمُؤْمِنِينَ يَغْضُوا مِنْ أَبْصَارِهِمْ وَيَحْفَظُوا فُرُوجَهُمْ ذَلِكَ أَزْكَى لَهُمْ إِنَّ اللَّهَ خَبِيرٌ بِمَا يَصْنَعُونَ” wate temaşeyî tiştê nekin ku heza we bo diçe, mebest ew tişt in ku Xweda ev nehî kiriye, ev tiştên ku temaşekirina wan helal nine, herwisa (يَحْفَظُوا فُرُوجَهُمْ) wate lingên xwe nêzî hev bikin û dapoşîn, helbet wî serdemî mêran zêdetir dizidaşe ji xwe dikirin.

Mesela têgihîştin li deqên Qora'ana pîroz di anv feqîyan û xelkê asayî de jî de astên cuda heye, ji bo mînak(hîcab) ku çendîn caran li Qora'anê de hatiye û li ti cihekê de bi wateya (xawika li ser ser) nahtiye, belkû mebesta wê cil û berge, û di gelek cihên din de jî mebest û wateyên cuda hene. Ji bo mînak: peyva hîcab li deqa ayeta 46 soreya E'eraf de: “وَبَيْنَهُمَا حِجَابٌ وَعَلَى الْأَعْرَافِ رِجَالٌ يَلْعَنُونَ كُلًّا بِسِيمَاهُمْ وَنَادُوا أَصْحَابَ الْجَنَّةِ أَنْ سَلَامٌ عَلَيْكُمْ لَمْ يَدْخُلُوهَا وَهُمْ يَطْمَعُونَ” bi wateya perde an ev tiştê ku te ya din cuda dike.

Li soreya “وَقَالُوا” فصلت ه: “قُلُوبُنَا فِي أَكِنَّةٍ مِمَّا تَدْعُونَا إِلَيْهِ وَفِي آذَانِنَا وَقْرٌ وَمِنْ بَيْنِنَا وَبَيْنِكَ حِجَابٌ” bi wateya berbesta hizrî û baweriyê tê.

Li ayetên din de ku peyva hîcabê tê de hatiye ku her yek bi wateyê: “وَإِذَا سَأَلْتُمُوهُنَّ مَتَاعًا فَاسْأَلُوهُنَّ مِنْ وَرَاءِ حِجَابٍ” (soreya Ekzab 53), wate di piştê perde an dîwarekê ve tiştê daxwaz bike. “فَقَالَ إِنِّي أَحْبَبْتُ حُبَّ الْخَيْرِ عَنْ ذِكْرِ رَبِّي حَتَّى تَوَارَتْ بِالْحِجَابِ” (سورته ص ٣٢), لێر ههتا باس له ئەسپ دەکات که سولهیمانی پیغمبەر حمزی پیی بو، واتا له پشستی ئاسۆوه دیار نهما. “فَاتَّخَذَتْ مِنْ دُونِهِمْ حِجَابًا فَأَرْسَلْنَا إِلَيْهَا رُوحَنَا فَتَمَثَّلَ لَهَا بَشَرًا سَوِيًّا” (سورته مريم ١٧)، بهواتای ئهوه دیت مەریه می پاکیزه که له سورته مریه مەدا هاتوه، له خهڵک دوور کهوتوه ههتا مەسیحی لی ده بێت. “فَقَالَ إِنِّي أَحْبَبْتُ حُبَّ الْخَيْرِ عَنْ ذِكْرِ رَبِّي حَتَّى تَوَارَتْ بِالْحِجَابِ” (سورته ص ٣٢), wirta behs ji hesp



dike ku pêxember Sulêman jê hez kiriye, wate li piştê bilindahiyê wunda bûye. “فَاتَّخَذَتْ مِنْ دُونِهِمْ حِجَابًا فَأَرْسَلْنَا إِلَيْهَا رُوحَنَا فَتَمَثَّلَ لَهَا بَشَرًا سَوِيًّا” (soreya32) bi wateya vê yekê ye ku Meryema pak ku soreya Meryemê de hatiye li xelkê dîr bû heta Mesîh lê çê dibe.

Îca ev hicaba niha ku heye digel yaku jêra dibêjin haydarbûna îslamê(الصحة) feqyan li ser jinê de sepandin e. Eger ne temaşeyî resimên jinên sed-salên derbasbûyî bikin her li dehkên 40, 50 û 60an heta digihîje destpêka 90an ku îslama tundrew pel havêtiye, xawik ti demî pêwera îmandariya jinan nebûye, jin jî niha sifûrtir û azadîr jî bûn, îslam jî her hemen îslam bûye. Lê digel serhildana rewta tundrewên îslamî heta sîvkatîrkrin bi bi jinên sifûr socdarkirina wan bi rûtbûnê de, xwe rût kirin, heyecaniya mêran digel xwe anî, hincet da destê mêrên tundrew yê îslamî û heta jinên tundrewan jî bi jinên sifûr sîvkatî bikin û pakiya xwe di xawikên xwe de bibînin, socdarbûna jinên din li ser rûtbûna wan de bibînin. Heta diyardeya herasankirina jinan pel havêtin digel serhildana vê rewta tundrewa ya îslamê ku jin berevajî malbatê dinav malê de wisa lê kir ku jineke sifûr bi serçaveya heyecanî û kêfxweşî birinê bibîne. Ew berbesta mezin zêhniyet

xiştê dinavbera jin û mêr de, bi awayek ku her jinek sifûr, socdeke sifûr li ser rûyê erdê dimeşe.

Piştî belavbûna nûçeya helwesta jinanên Rojhilatê û piştî can jideştana Jîna Emînî bi destê hêzên polîs yê bi navê exlaq(geştî îrşad) a Îranê, û ragihandina helwesta sedan jinên Rojhilatê bi birîna porên xwe û agirberdana xawikên xwe ku bertekên lojîk yê bûyereke hovane ya bi wî awayî ye ku xanimeke bê soc canê wê li ser vê bûye qorbanî, hevdem digel kombûna jinan li bajarê Sulêmanî û agirberdana bi xawikên xwe li ber deriyê baxê giştî de. Tevî zêdetir li yekdengî û hevxiyê bo teva-hiya pîrsê, lê, wira û wêderê jineke xawik li ser postên xwe belav dike ku wisa diza-nin havêtina xawikê û agirberdan, bi wateya rûkirina jinan bona têrkirina hezên nêr e. wirta nabe kêmek ji wan herdu helwestan hûr nebin.

Ez hertim li dijî sîvkatîkirin bi her ol û aydayek bi taybet bi awayê qirmîçok û gêj bi bê bingeş û bi bê hûrbûnê, her wek ku li dijî helwestê hatî îşarekirin û min kombûnek ku rege rêkxiraveke hizbî li piştê be lê, piştîre helwest û kobûnên bi wî awayî aliyek pozîtîv tê de ye, ev jî berve-danîna helwestê li tev warî de

»»» Doma R:9

baştire ji bédengbûn û netirsî di asta bûyereke nemirovane ya bi wî coreyî ye.

Dawîn car mesele gelek ji vê kûrtir û aloztir e û heta tirsnakitir e jî ku tenê porbirîn û xawik havêtinek be, gelek ji vê mezintire ku hind naşîrîn bike û bi hinceta tûjkirina rûtkirina jinan be. Mesele li sadetirîn hûrbûnê de ye, mesela azadbûna ademîzade, azadiyek ku hêjayê mirovahiya jinê ye, nek derkevina piçek por bibe mayeya ji deşdana jiyana keçeke genc ku hemû tawana wê piçek porê wê ye ku li aliyeke xawikê de derdikeve, mesele kirameta mirovî ya jinê ye, ev jina ku me hemûiyan li ser ekranan

dîtiye ku çawan bi lêxiştin û êşkencekirinê rapêçan û havtin nav tiromibîla polîs kirin û bi birayê wê re jî sivkatî tê kirin, gelo ev keçika eger tale poreke wê derkevibe hêjayê wê core mi`amilekirina hovne ye? Ey gelo dibe xelk li asta wan dîmenan de çavên xwe dabixin û zimanê xwe qut bikin? Yên ku porên xwe birîn û xawika xwe agir berdanê eger beşek li dijî sepan-dina hicaba bizorê bin, beşek zêde li dijî bînpêkirina nîrxa mirovî ya jinan e. Gelo eger dîmenek berevajî encam bidin, jinek ku dixwaze xawika xwe li serê xwe bike, gelo rewa ye bizorê xawikê pê bidin jipoşin an bi zorê serê wê pê bidin rûtkirin? Lê vê dema ku ev jina nalîn azadiya xawik ji xwe kirinê bînpêdike? Yên han berevanîkirin ji xawikên xwe dikin ev

tişteke taybet bi wan bixwe ye ti demî ya tişteke din nine ku bixînin terazoyê digel wan hovane danin berhev ku digel wê keçikê û hezaran keçikên din yê di nav Îranê de tê encam dan.

Mesele gelek sadeye ji yaku em nabe wisa zarokane û bişîrînek bi bê hizirkirin li tev rehendên mijarê, sizayên nebicî derkin û bi xawikê ji me bibe Meryema paqij û ser rûtan jî bavêjin aliyê bêdeban û bi xwe rûtkirinê bo têrkirina kêfxweşiya mêran wan tometbar bikin. Xwe eger arîşe porên jinan biba dibû ku jin bixwe jî bi bê por bihatiba afrandin.

Ji wan hemiyan girîngitr ev yeke ku li ser mijarekê diaxivin ku bi bê berpirsyarîtiyek mezin li ser biaxvin,

piçûkirina mijarek bi wî awayî di yek hizrkirinê de ku ev jî bi paqij nîşandana jinên ku xawik li ser sivikirin û socdarkirina jinên sifûr û bê xawik tişteke yekcar zarokane û neberprisane ye, axavtina wan kesên ku ti nîqaşkirin di gotûbêjan de pênin. Bila axavtin li ser maf û azadiya ademîzad be bilî vê ku jin an mîr, axavtina vê li ser deşhilatekê be ku tev hêz û şiyana xwe xîstiye ger bo berevajiyê jinê û bînpêkirina maf û azadiyên ji rêya dapoşina bejin û bala wê û talek porê dike bi tohmet û mafê kuştina wê dide deşte polîsekî nezan û nexwande-van li ser navê (polîsê exlaq an geşda îrşad)ê.

Daxuyaniya ENKS li derheq şermezarkirinarejîma Îranê û piştigriya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê

Ji roja nozdehan ji Heyva Rezberê ve ya em tê de, û piştî binaxkirina terma(cendeka) ciwana Kurd a pakrewan “Jîna(Mehsa) Emînî” li cîgeha zayîna wê li Bajarê “Seqeze”, ji ber rastîhatina wê ji îşkencekirineke hovane û mekin re, li ser deşte celadên ku bi “Asayêşa Sincê li Tehranê” tene navkirin, bi behaneya ku nuxumiya (hicaba)wê ne rewa ye! Û di nav heyamin xemgînî û êşe de, xwepêşandanin gewre di bajar û bajarokên Kurdistanê Rojhilat - Îran de tene kirin, û wê tewana hovane -ya ku Rijîma Îranê di dermafê Keçeke Kurd e vêguneh de kiriyê û vêsûc hatiye kuştin-şermezar dikan.

Û bi renekî fere li ser herdu astên fermî û gelêrî ev tewana hate nefret û şermezarkiriin; Di vî warî de, Neteweyên Yekgirtî û hin dewletan nevehesî û şermezarkirina xwe ji bo kuştina “Jîna Emînî” dan xuyakirin, mîna Amerîka, Firansa û hin dewletên din, bi ser de jî piştigriyeke fere ji gelê Îranî bi rengereng pêkhatayên wê ve pêre hate kirin.



Lê, Hikometa Tehranê bi kuştina keça bûye qurban bes nekir, wê bi xwepêşandên ku li Kurdistanê belav bûne re jî bi tundûtûjî û qurşînên jîndar da û şand, ji ber wê jî hejmarek ji hemwelatîyan pakrewan bûn û bidehan jî birîndar bûn. Û ev bûye roja çaran e û hîn çarçoveya xwepêşandanên şermezarkirina tewana kirêt fere dibe, ta ku gihîşte Tehranê û bêtirî /15/bajarên din, û tede gewriyên xwepêşandêran bi siloganên mîna (mirin ji dîktator re, mirin ji “Xaminî” re, mirin ji wîlayita El’feqîh re) dikan qîreqîr.

Rijîma Wîlayit El’feqîh a zefîkar a ku ji /43/salan ve Îranê detstlat(hukim) dike, siyaseta devgirtin, bînpêkirin û tundûtûjiyê li hundir Îranê bi kar tîne, û tewanbarkirina(tuhmetkirina) kîjan rikberî/ê bi girêdana bi derve re bes dike ku sezaya (cezaya) darvekirinê di dermafê wî/ê de were deranîn! Ji bilî bikaranîna siyaseteke tekane ye dîktator li ser hemwelatîyan, weke ku ew sermiyanên Gelê Îranê -yê ku rewşeke rewşeke aborî pir pîs û zehmet dijî- vîrdewêde (li arê) çedike, da ku li cîgeh û deverine din li cîhanê -yen ku tu berjewendiyên Gelê Îranê ne ji dûr û ne nêzîk tede tune ye- xerc bike, û li ser bingeha bine’olî deştewerdanê di rewşên hin dewletên hêrêmê dike, ku bûye sedema afirandina rewşeke netebatkirî li wan ciyan.

Di heman dema ku em tewana Rijîma Tehranê ya Kuştina Keça Kurd a bêsûcane “Jîna Emînî” şermezar û ne’ilet dikan, em piştigriya xwe bi birayên xwe li Kurdistanê Îranê re radighînin, em redkirina(refizkirina) wan ji piroseya kuştinê ya ku di dermafê wan de tê bikaranîn rewa dibînin, û em doz li

dewletên mezin û Rêxiştina Neteweyên Yekgirtî dikan, ku bi erkên xwe yê mirovane rabin, da ku alava pelçiqandinê ya xwînî ya Rijîma Îranê di dermafê xelkê me yê Kurd de li Kurdistanê Îranê rawestînin, û bi serpêreştiyeke navdewletî kujeran bidin dadgeheke dadmend.

* Sermedbûn û abedîn ji giyana Pakrewan “Jîna Emînî” û giyanên pakrewanên ku bi qurşînên hêzên ewlkariyê li kaştin û meydanên xwapêşanderiyê şehîd ketine re.

* Serberjêrî û rûreşî ji Rijîma Îranê re, ya ku bi hêsin û êgir bi gelê xwe re dide diştine.
21.9.2022. Z

Komîta Rêzanî
Ya
Partiya Yekîtiya Deokrat a Kurd li Sûriyê

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Canjidestdayên nerizayetiyan meha Xermananê; “Mînû Mecîdî” li Kirmaşanê, canê xwe ji dest da

Piştî kombûna nerizayeti li hember kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî”, roja Sêşemî 29ê Xermanana sala 1401an, welatiya Kurd a bi navê “Mînû Mecîdî” ya xelkê bajarê “Qesra Şîrîn”ê, di kombûna nerizayetiya derheq Kuştina “Jîna Emînî”, bi teqeya hêzên ewlehî li bajarê Kirmaşanê canê xwe ji dest da.

Bi hejmarkirina vê haletê, heta niha rêjeya kuştîyan li bajarên Kurdiştanê gihîştîye 7 kesan.

Amara kuştina nerizayetiyan a meha Xermanana sala 1401`an

Di 28ê Xermanana sala 1401`an a Rojî de- “Muhsên Mihemedî” kurê “Xelîfe Mesûdî” di kombûna nerizayetiya bajarê Dîwandereyê de bi sedema kûrahiya bîrînan di nexweşxaneyê de canê xwe ji dest da û bi sedema rêgiriya navendên ewlehî, termê wî welatîyî li demjimêr 3ê şevê 29`ê Xermananê bi axê hate spartin.

28ê Xermanana sala 1401`an a Rojî – “Riza Lotfî” di dema kombûna nerizayeti li bajarê Dêwolanê, bi teqeya hêzên ewlehî hate kuştin.

28ê Xermanana sala 1401`an a Rojî – “Fireydûn Mehmûdî” xelkê bajarê Seqizê, di dema kombûna nerizayeti li bajarê Seqizê de canê xwe ji dest da û bi sedema rêgiriya navendên ewlehî, di şevê de bi bê birêveçûna ti rêûresmekê, bi axê hate spartin.

28ê Xermanana sala 1401`an a Rojî – Piştî kombûna nerizayetiya li derheq kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî”, roja Duşemî 28ê Xermanana sala 1401`an a Rojî, “Fuwad Qedîmî” kurê “Ebdullah” di dema kombûna nerizayeti li bajarê Dîwandereyê, bi dijwarî birîndar bibû û roja Çarşemî 30ê Xermananê li nexweşxaneyê “Kewser” a bajarê Sineyê, canê xwe ji dest da.

29ê Xermanana sala 1401`an a Rojî – “Fercad Derwêşî” temen 23 salî û kurê “Yûnis” xelkê gundê “Balav” ê ser bi bajarê Urmiyê, di dema kombûna nerizayeti di wî gundî de bi teqeya hêzên ewlehî canê xwe ji dest da.

29ê Xermanana sala 1401`an a Rojî – Zekerîya Xeyal nûciwanê temen 16 salî yê xelkê bajarê Pîranşarê, di dema kombûna nerizayeti li wî bajarî de bi teqeya hêzên ewlehî canê xwe ji dest da.

Du welatîyên nerazî bi kuştina hikûmetî ya Jîna Emînî li bajarê Dîwandereyê hatin binçavkirin

Roja Duşemî 28ê Xermananê, du welatî yên bi navên “Soran(Zaniyar) Mihemediyan ê 31 salî û Simko Mihemediyan ê 35 salî” xelkê bajarê Dîwandereyê, di dema kombûna nerizayeti ya li derheq kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî”yê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin binçavkirin.

Ew du welatîyên Kurd ku birayê hev in, piştî binçavkirinê bo cihek nexuya hatine veguhaştin û ji qedera wan ti zaniyariyek li ber dest nîne.

Hevdem digel mangirtina seranserî li bajarên Kurdiştanê, welatîyên nerazî li bajarên Dîwandereyê bo nîşandana nerizayetiya xwe li derheq kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî”, rîjiyane ser şeqaman û di vê kombûna nerizayetiya de silogana “Netirsîn em bihev re ne” dan.

Bi destê verdana hêzên dije şoreş û hêzên ewlehî, tunditîjî kevtê vê kombûna nerizayetiya.

Hêzên ewlehî û hêzên dije şoreş bi bikaranîna gulleyên saçmeyî, teqe li welatîyên nerazî kirine û 10an welatî birîndar kirine.

Yek ji welatîyên nerazî bi kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî” yê bi navê “Muhsin Mihemedî” kurê “Xelîfe Mes`ûd” û xelkê bajarê Dîwandereyê bi sedema teqeya hêzên ewlehî di vê kombûnê de bi dijwarî birîndar bûye û li navenda dermanî ya bajarê Sineyê de canê xwe ji dest da.

Merîwan; Welatîyekî nerazî ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin

Roja Sêşemî 29ê Xermananê, welatîyek nerazî yê bi navê “Xebat Weysî”, temen 24 salî û kurê “Ebdullah”, xelkê gundê “Gulçêr”ê ser bi bajarê Merwanê ku di kombûna nerizayeti li derheq kuştina hikûmetî ya “Jîna Emînî”yê de bi teqeya hêzên garda dije şoreş hatibû birîndarkirin, ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna belgeya yasayî êrîşî li ser mala wî welatîyî kirine û navbirî binçav kirine.

Herwisa vê çavkaniya agehdar gotiye ku, ew welatî piştî binçavkirinê bo cihek nexuya hatiye veguhaştin.

Roja Yekşemî 10ê Befranbar a sala 1400an a Rojî, “Xebat Weysî” bi bê belgeya yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û li roja Duşemî 9ê Reşemeyê hemem salê, bi danîna barimteya 1 milyar Tumenî heta dema dadgehîkirinê, hatibû azadkirin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (430)

